

# Oxir be kekê REZO!

Rêberê Silivî

Xwediyê hestên nazik û dilê mezin,

Mamosta REZOYÊ OSÊ!



Îro, em gelek dost, heval û hogirên te, li ser benderên gundê Degşûriyê li dora te civiyane, destên me li ser hev in, hişmetkar û stuxwar xatirê dawîn ji te dixwazin. Min, hilwest, gotin, cefa û xebatên te di bîra xwe de tanîn, di nava bîranên xwe de noq bûbûm, ji cih û demê bi dûr ketibûm dema dengê xwişka te ya ku bi şewat digirî, ez hişyar kirim û veğerandime ser rastiya dem û cihê ez lê, wê digot û dibiland:

*"Hêjawo birawo, bi qurbanim birawo,*

*Ez heyrana te û hevalên te me birawo.*

*De ka serê xwe rake, li dora xwe binêre birawo,*

*rabe mêvanên xwe bibîne heyrano.."*

Bê vena xwe, di hundurê xwe de ez keliyam, agirê dogehê kete dilê min û çavên min tejî rondik bûn!!...

Ma hemberî vê fermana Xwedayê gewre, ji rijandina van herdu rondikên germ pê ve çi ji destê min derdikeve kekê min?!...

Belê, hêjawo, di vê gorê de serî deyne, çavan bigre û bila dilê te bê kul û xem bimîne, ew tovê ku te û hevalên xwe bi dehê salan çandibû vaye kat daye, şîn bûye, kulîlk girtiye, îro bi hizaran, bi sedê hizaran keç û lawên gelê te li zimanê xwe xwedî derdikevin, bi serfirazî ew pê dixwînin û dinvîsin û ala zimên bilind hildane jor...

Bila dilê te yê mezin bê derd û kul raze ey heval, westan û cefa te ya ji bo ziman û wêjeya Kurdî badilhewa ne çûye, xebata te ya di STÊR û paşê 17 salan di PIRSÊ de li nik gelê te cihê rûmeteke mezin û giran e, nivîs û berhemên te jê re sermiyanekî buha ye.

Belê mamoste, ez nizanim derheqa koçkirina te çi bêjim û çi ne bêjim, lê ezê jî weke xwişka me gotiye bêjim:

"Hêjawo hevalo, xwezî hêj tu bimayî, da ku te berhemên keda xwe dîtiba. Hêjawo hevalo, xwezî hêj tu bimayî, da ku şagirtên te ji giranî, hişmendî û dûrbîniya te bêtir sûde bigirtana!!..."

Erê keko, em tev tovê mirinê ne, tu kes ta ebed sax namîne, lê tiştê dil û hêviyên mirov xweş dîke wefadariya gel e, ewê ku mirovên mîna we her û her di hişê wî de zindî dimînin.

Çavan bigre, bila dilê te yê mezinî westiyayî di xaka bav û bapîran de palde, di hêlana hvrêşimî ya ji helbestên Cezerî û Xanî hûnayî de têkeve xewa giran!.

05.03.2010Z